Piştî çend heyvan min xwest ku ez li kolan û zikakîn gund bigerim û ez zanibim ku çend kolan û cihok û kortal jî hene. Di sala 1969an de tirêna min weke hafizekî kor ket ser demirê xwe de, wê demê gelek pere ji tune bûn ku ez tembûran bikirim, me ji xwe re qutîk - mişik çêdirkirin û min hewil da ku ez rîkê ji xwe re hilbêjîm û min têkîlyê xwe bi Cegerxwîn, Tîrêj, Hadî Behlewî re xurt kirin, û ez geleki xembarê mamoste Behlewî û malbata wî xelkêni Girzîn tevan im, ew ji min re qonaxek geleki giring bû, ger ne ew bana min nedikaribû ew qonax deh salan derbas kiriba, ji nişkave têkiliyên me çebûn, di sala 70ê de min serdana wan li gund kir, min dît xelkin rewşenbir û zana ne, pêkenâna bi kesen kor li gel wan tune bû, vajî wilo rîz û hurmetê jê re digrin û dixwazin pêş ve biçe, û cara yekê min stran gotin, min yê mamoste Hadi Behlewî gotine mina strana "Ji Bo Xatirê Her Du çavan Dil Ketime Hemû çava"

Piştî Seydayê Cegerxwîn çû şamê ez jê dûr ketim, lê ez nêzîki Seydayê Tîrêj mam, di warê helbestê de alikariyek bê sînor ji min re kir, nizanim min jî çiqas alikari jê re pêşkêş kir, ji ber wê çaxê Kurdêne me 10% xwendevan

bûn, wê demê tu kesî pirtûkên Seydayê Tîrêj nedixwendin, min bi riya stran û kasêt xwe helbestvan Tirêj di nav millet de belav kirin. Birastî wê serdemê de Tembûr û stran û gotin di nav Gabaran de geleki şerim bû, û ez vê yekê bi zelalî dibêjîm, gelekan nedixwesin ku ez herim malen wan, û hînekan min ji malen xwe derxistin û digotin madam tu li Tembûrê dixe û te em kirine mitirb û qereçî neyê mala me, ez karim navê wan eşkere bikim ew hin sax in, ew yek ji hîleke civakî bû, tev ku Gabaran mirov in niştimanî û welat perwer bûn, kesen temen mezin ji hîla civakî ve min dişandin, lê hindek xorten wan jî hebûn alikariya min dikirin.

Piştî salen 75-76an ew mesele ji pîvana Gabartîye derket, gîhiş Amûdê, Qamîşlo, Alyan, Koçeran, Kobanî, Efrîn, piştî re têkiliyên min bi Cemîl Horo re û bi koma Azadi a Şamê re çebûn, piştî re karê min berfirêb bû, bi rastî ne min tenê ev kar kir, ez nabêjîm ez û ez, ji ber ku gotinek Kurdî heye dibêjî "Ne kurmancê bê rez, ne koçerê bê pez, ne zilamê ku xelik nebêjîn filankes, ew tenê bêjê ez û ez, jê neke hêviya bi lez û bez". Gelek xelik hebûn alikariya me dikirin, piştî meha 10an ji sala 1977an rejîma Sûrî em tengav kirin, mala me çû Qamîşlo û min pir zehmetî li wir ji hîla ewlehiya siyasi, dewletê, û ya leşkerî kişand, yekî mina Fotbolê min dida yê dî, piştî sala 1978an min nema karibû herim şahîyan, du zarokên min jî çebûbûn, birçûbûn, hewedarî hebû, hin partîyen li Kurdistana Tirkî li Nisêbînê û Cizîrê alikarya min kirin, vêca Hikûmet bêtir li min tûj bû, di sala 1979an de mecbûr bûm çum Kurdistana Iraqê, pêş çûm serkirdiyeti demkî cem rehmetiyê Samî Ebdirehman li devera Goya, wê demê rehmetiyê Cemîl Sor, Cewher Namîq û Samî gotin min bira em nikarin te xwedî bikin, ji ber em qereqol in û cihekî taybet ji me re tune ye, û tu ye û zarokên te jî bi te re ne, eger tu herî Kurdistanê wê çetir be, em ê navinan bidin te û wê ew li te xwedî derkevin, rabû ez hatim gel hevalekî jê re digotin Adil Hirûrî, ew ji di 81ê de hate girtin û şehid bû, lê ew di 79an de li min geleki xwedî derket û ez bi mamoste Tehsin Taha dame nasîn, wî ji ez anîm Hewlîrê û min bir radyoya Bexdadê, Tahir Tewfiq, Elî Mardan, û Fûad Ehmed da naskirin û wan jî gelek sude li min kirin di aliye hunerî bitaybet di warê nota müzikî û meqaman de, min jî gelek saz çedîkîn, wek a "Ey Bilbilê Dilşad" min çêkir lê min nizanibû çi mqam e, wan ciwanmîran "Tahir, Elî û Fuad" min derbasi

akadîmiya (Hunerên Xweşik) li ser bingeha perwerde û pisporiyê kirin, bi rastî wastekarî bû, min du sal û nîvan de lisans bidawî kir, ji 736 sagirtan ez di pileya didwan de hatim, mixabin keçek li pêsiya min bû.

Piştî re di 14/6 sala 1981 xwepêşandanek li Hewlîrê lidar ket, em xwendevan bûn, em kişif bûn, me baz da û em çün jiyanâ pêşmergetiyê, ez bûm berpirsê koma şoreş li radyoyê, pêşî li Lalane bû, dûv re çû Iranê, ez du caran li ser wan çiyan birindar bûm. Piştî re me biryar da ku ez dakevîm nav millet, ji ber radio mîna zindanê çar diwar in, hew tê nûçeya çê bike, şirove bike, û ez ji vê yekê aciz dibûm, ez hatim devera Badînan û bi destê Cehşîkên Sedam ve hatim girtin ew ji di dawiya 83an de bû, ji ber Pêşmergîtyê ez du sal û heyşt heyz û 23 rojan di navbera Erbilê û istxbaratê Mûsilî û Kerkûkî li ber destê Eli Kimawî û dawî ji Eboxirêb de ham, dûv re me radestî rejîma Sûrî kirin.

Li Sûrî xwestin me tazî bikin, min girtin û ji qazîve min berdan, ta ku ji millet re diyar bikin û bêjîn vaye me ew berda û mîrik zilamî me ye, eşkere ji min re gotin em te nagrin, eger em te bigrin em ê te bikin leheng, ma em din in..?

Ebdirehman Nehar bi xwe ji min re got eger tu piştigiriya xortan bike ta xort herin çiyayê Tirkî şer bikin em ê te berdin, û em ê te bikin xwedî qedr û qîmet lê min ev yek qet qebûl nekir, lê gelek camêran mîna mamoste Kemal û Hemîd Hac Derwîş dev ji min bernedan û alikarya min kirin, lê piştgirêk man berdewam, di sala 1989 ez çüm Ewropa û min jiyanê nû berdewam kir, di sala 1990î de me karek bi komicekrewşenbir û hundermend re kir, û derdora 17 partîyen Kurdi ku em sistemkî bi navê "Hevkâri" deynin ta ku em karibin dengê Kurdan li Ewropa bilind bikin, hevkâri ji her çar parçê Kurdistanê bû, ew ji du salan berdewam kir, ev gaveke baş bû ji ber ku piştî re hikûmeta Elmanî alikarya min kir û iqame û passport tevlî mafê nasnameya siyasi danc min, û me jiynek bi azadi û aramî ta sala 2004an berdewam kir rewşa min ya derûni gelek xerab bû, û li ser daxwaza hevala ez hatim Kurdistanê, û ta anha ez li vir in, lê ez diçim Ewropa û ez têm, di sala 2012 de ji karek taybet ez çüm Rojava û heftikê mam, piştî re min sê sal û şes mehan li Kurdistan TV wek bêjîr kar kir û çend heyvan li telefizyona Hewlîrê ji min kar kir, gelek taybendiyen min derbarî pîrsa Êzdîyan de hebûn, di dema helbijartinan de ez diçûm deveren Şingelê.

**Sî'ûd û Hekîm Beşar partiî kîrin tar û mar Ji destê wana sed hewar Nesirîdîn ji kîrin kar Ismaîl hemî ji bû bar Alûcî bi wê kulê mir Ü Heroj gotin yekîti**

**Ü Li vî gundî û li wî gundî Ü de pîfke berde xîtarar Ü Tiştek jê nebûn diyar Name bo PYDê ye Kurdishan ne ya kê ye Ena mîr û intê mîr Men mina yîsûq elhimîr Ji bextreşa Kurda re Salih Gedî bû vezîr**

Ev helbest min ji gişan re gotiye, ji ber vê yekê wê ji min nerazî bin, ji ber ku ez rexnan li wan dikim, ew dixwazin ku ez ji wan re bêjîm belê ezbenî, min sozek bixwe re daye ku belê ezbenî li cem min çenâbe di mesla Kurdistaniye de, kî aciz bibe bela aciz bibe ji min, ne xema min e.

**- Di hevdîtinekê de li ser Zagros TV te got min tembûra xwe na-niye wek rengeki şermezarkirin û protostokirinê li ser tiştekê ku li Rojava diqewimin, gello hûner dikar bi wê rasپرîye rabe ku bandora wan li ser raya giştî**

hebe?

Eger hemû hunermend bi wê fikrî re bin, wê karibin karekî bas bikin, eger ez pirotisto bikim û wek nimûne Xelil Xemîn tiliyen xwe hilde û bibêjî biji serok, yan biji Mam Celal, dema ku bîr û bawerê me ne yek bin û em bi partiyan ve girêdayî bin wê rewşa me ev rewş be, lê gava hunermend tev yek bawerî bin wê karibin bandorekî bikin, ji ber ez bawer im ku bandora hunermendê xwedî helwest li ser mîletê wî pênc qatî ya serkerdeyan e.

**- Kî bêtir ji malbatê bandora xwe di warê hunerî de li Se'îd Gabarî kir?**

Hunermend di malbata min de tune bûn lê diya min rehma xwedî lê be dengê wê pir xweş bû, ew mîna tomarkerê bû, li odeya apê min û bavê min ci bihata gotin wê jîber dikin, apê min Hecî Mihemed jî hem hestek wî netewî û welatparêzî hebû hem hin helbest dinîvisand, min helbesten wî jîber dikirin. Ew ji yek ji ri spiyen ci-vata Kurdi bû û bandora wi li ser min hebû.

**- Te gelekî ji herdû helbestvanan re Cegerxwîn û Tîrêj re strayê sedem ci ne ?**

Na min ji gelekian re straye lê ev kes destpêk bûn li gorî têkiliyên min bi wan re, lê min piştî wê ji Ehmedê Şêx Salih re gotiye:

"Şoreşa Pak û Nuhêl û Xanêdan", min ji rehmetiyê Emerê Le'lê re gelek gotiye, mina "Xana Bindest" û "Yarek Min Heye" ji Yûsif Bezarî re ji "Hat Xwes Buhar Çûm Nav Gula" û "Koçê Ma Bar Kir" di sala 1978an piştî re Mihmed şêxo di sala 1986an de gotiye, û "Yarek Min Heye Bi Navê Zin" a Emerê Le'lê bû, pêşî min 78an de gotiye, min ji gelekian re gotiye lê ez neçar dibim dema ku ez behsa yê destpêk dikim behsa wan bikim, ji ber bandorek wan mezin li ser min heye ta niha, û ew bûn ê min bi millet dane nasîn, bêtir Tîrêj ji ber têkiliyên wî bi birayê min re hebû û ew dihat mala me û ez ji Cegerxwîn ji qut nebûm.

**- Navdarya te ya dsetpêk ji kîjan stranê bû?**

Destpêk bû, min du stran gotin, xelkê min nas kir, "Leyla Qasim" û "Bilbilê Dilşad" bû, min Leyla Qasim di dawîya sala 1975an de got û Bilbilê Dilşad di 26/11/1976an de min gotiye, di wan her du stranan de ez hatim naskirin.

**- Cara yekê tu hat girtin sedem ci bûn, tu çiqas ma, û li ku bû?**

Cara yekê ez li Qamîşlo sala 1977an de hatim girtin, ahengîk li taxa Qidûr Beg hebû, ez 49 rojan li gel wan mam û alavên min ji şikenandîn û lêdanek xweşik ji li min kirin, û piştî wê bû ser mehê û binê mehê her û wer.

**- Strana ya herî li ber dilê te şérin kîjan e?**

Bi gişî hemû stran wek zarokên merov in, lê hindek stran hene - wek mirov- yadigariyên min pê re hene, dema ku min baz da Kurdistanê ez zewicî bûm lê min ji yek di jî hez dikir, wî çaxî min hevalak xwe li dû xwe hişt û ez geleki bî vê yekê eşiyam, û li ser çiyayê Atroş min ev helbest çekir:

**"Dîlber tu bi Xwedê ke bîrînê min bikewîne**  
**derman bo herdû çavêt**  
**reşbelek zû ji bo min bîne**  
**Emrê min bû bîst sal û te kopal**  
**daye dest min.**

Xortek pir ciwan bûm te kirim kalê livîna

Xortek pir ciwan bûm te kirim wek pîr û kala

Dûr ketim ji evîna sorgul û dost û hevala

Ew çav min nemane ez bigerim li nav gund û mala

Te bi xemîl û ciwaniya xwe ke dermanî min bîne

Ez ne helbestvan im, lê dema ku ez dikevîm heriyê de em dikarin xwe xelas bikin.

**- Helbet te gelek stran çekirine û gelek hunermendan ji te bîrîne, hindekan ji wan destnîsan kirine û hindekan ji destnîsan nekîrine, tu dikarî ji me re hindek minak bîbîjî?**

Belê gelek in, Şarîbana Kurdî stranek dizî ez nabejim min ew stran dayê, bi kurmancî navê wê dizi ye. Hirmetê dizi û negot malî ava ji, Şarîban ne ji min tenê diziye, ji hunermend Mehmed Ezîz ji diziye.. Di 1987an de min ew stran li Qamîşlo çekiribû:

**"Dayê Ez ê Xatir Ji Te Bixwazim Bi Xwendîn û Zanîn Ez Serfiraz Im Nebjî Kurê Min Bûye Eşqiya Dibim Partizan Li Çol û Çiya"**

Ya dî ya "Bilbilê Dilşadî" bû, di sala 1988an de kak Şivan Perwer li Siwêdê ji xwe re tomar kir û got awaz û müzik Şivan Perwer, lê ew ne rast e û tu bingeh jê re tune ye, û gelekian jîbili wan ji dizi û negotin, herwiha gelek dibêjîn ku ev stran ya min e. Min 1232 stranê filklorê Kurdi li Dihokê tomar kirin, ta ku dev ji Erebî berdin ji ber ku dawetên dihokîyan ta 1996 ji 4 stran bi Erebî bû, 5 bi Tirkî bûn û yek bi Kurdî bû, min dît ku pêwîst e ku ez van stranê filklorî daxim ta ku ev kelepor nemire, min da çend xortan hêdî wan ev stran li ser tilfîzyonan digotin û ne digotin ev ji karê min e û destnîsan nedikirin, wisa nabe ma we ev stran ji ku anîye, we ji mala diya xwe anîye, mane ev filklor e, ne yê min e ji??!!

## Civaka Me û Tevna Civakî

**D**i salên dawî de di nava kurdan de mîna hemû mîletên cîhanê sosyal medya bi rengekî mezin belav bû, û tevî ku li ser erdê ziman û hebûna wan ne-hatiye qebûlkinir lê di gelek rûpelên sosyal medyayê de zimanê Kurdî wekû zimanekî fermî ye û wek wî wekû zimanen din ên dunyayê tê bikaranîn.

Kurd jî ji ber ku deveren wan ên ku xwe tê de bînin ziman û derdêne xwe ragihînin tune ne, bi awayekî gelek berfi-reh berê xwe didin sosyal medyayê ango tevna civakî û li wir derdêne xwe parve dikin û kulên xwe jihev re dibêjin. Kurd ku hinekî di van waran de nû ne, dîsan jî gavêna baş avêtine û hejmara wan têrê dike ku cîhan bibêje ku Kurd mîletekî gelekî aktiv in, li ser tevna civakî.

Tevî ku gelek Kurd ne zimanê dayikî bi kartînîn û berê xwe didin zimanen Tirkî. Erebî, Farisî, Almanî, Ingilzî û Rûsî dîsan jî mijarênu li ser Kurden, jiyana wan ya rojane û herêmêm wan di nave-roka xwe de hiltînîn, beşekî gelekî mezin di tevna civakî de digrin.

Lê pîrsa giring ku gerekî mirov ji xwe bike, gelo Kurden ji vê medyayê sôd wergirtiye?

Mîna her tiştîn din li cîhanê sosyal medya jî şürekî du alî ye û dikare hem karê mirov biqedîne hem jî zîrâb bîghîne mirov, dîrdor û civakê.

Lê mirov dikare derbarê Kudran û Medya civakî de xirab an jî qenc biaxive?

Di destpêkî de û bi taybetî di Paltalkê de Kurden gelek şaxen xwe vedan û gelek ji

kesen Kurd ên niha li ser asta civakê tê naskirin jiyana xwe ya siyasi li Ewropa di Paltalkê de destpêkirin û piş re jî derbasî siyasetê bi awayekî normal bûn.

Bi taybetî li Ewropa û ji ber dûrbûna kesan ji hev û tunebûna jêderê agahiyan an jî kîmbûna wan, Paltalkê şeweyekî gelekî baş bû da ku Kurd tê de bîghîjin hev û bi taybetî jî di sala 2004an de pişti serhildana Qamişlo Kurd li dezgehekê geriyan û heweedariya xwe bi medyayê dîtin û Paltalk di wan rojêne serhildanê de yek ji alavên herî giring bû di jiyana Kurden ku bi internêtê re didan û distandin..

Niha jî di salên dawî de Facebook û Twîter derketiye, bi giranî Kurden bakur Twîterê û Kurden Rojava jî Facebo-ökê bikartînîn.

Di van herdû malperan de zimanê Kurdî tê bikaranîn, lê bi milyonan Kurden ku di van rûpelan de tevdigerin ji wan ançax ji sedî 20 ku zimanê Kurdî wekû zimanê Rojane û çalakiyan bikartînîn..

Lê ji bîli bikaranîna ziman mîjar ên danûstandinan Kurdî ne, gelek agahî, nûcê, bîranîn, çîrok, çand û huner, ziman û çalakiyan cuda reng li ser Kurden an jî bi zimanê Kurden li ser tevna civakî tê gotübîjkirin.


Ev aliye pozitîv û qenc e ku Kurd tê de sôdê ji tevna civakî dibînîn û karê xwe pê hîsan dikin, dengê xwe diğhînîn cîhanê lê dîsa Kurd jî mîna hemû mîleten Rojhelatî li van deveran gemara xwe ji radixin ber çavan her wiha erîşan li diji hev pêk tînin.



Kawa Şêxé

Kurdan di paltalkê de gelek şâşî kirin heya gîha astekê ku gelek Kurden nema karfîn têkevin paltalkê de, ne jî nêzîkî wê bibin û asta Paltalkê daket heya giha asta ku bû cihê şerm û eybê û edî her kesi ji ber hebûna xwe di Paltalkê de fedî dikir, û dema ku civakê bixwesta arzanbûna çandekê nîşan bidin digotin Çanda Paltalkê ye, Dema niha jî bi heman şeweyê çanda arzan li deverna jê tê belavkirin lê hinekî kêmîtir. Kurd di medya civakî de derewan dikin da ku kesê pê re ne lihev kêm bikin. Hin Kurd li dijî kesen ne ji Ol an jî partî an jî hemfîkira xwe dijberiyeke dijwar dikin û bêtir perçeyen civaka ji heykîtî bêtir dûrî hev dixin. Li ser hin rûpelan Facebookê mirov dikare agahî û tiştîn giring bibîne lê ji ber ku taybet e û girêdayî kesayeta her kesi ye tiştîn arzan jî li ser xuya dikin.

Bi gişî Kurd jî mîna hemû mîleten din ên Rojhelatî Navîn in, li ber xwe didin, şer dikin, lê di heman deme de xizmeta partîyen xwe ji dikin, carna jê dibin oldar û netewa xwe jîbir dikin, carna jê ji dikevin xizmeta dijmin û neyaran û mîna kewê ku li ser xeslê bixwîne, refîn xwe ji tê werdikin.



Ebûdulselam Xoce

herwiha ji hîla rîexistinê mafê mirovan li devera me!!! sedem ci ne ku hewildan nayen kirin bo belavkirina têghişinê di riya semînar de ta ku, bê diyar-kirin bê çîqasî bandora vê diyar-deyî, pêşî li derûnî û jiyana wê keçê dibe û li malbat û civakî bi gişî ji dibe.

derbarî vê diyardeyâ bivek "xeter" e li ser civakê, pîwîst e ku mîkanîzmeke hûrbîn bê dîtin û ev diyardeyâ han bê hilbijartî wekû tawaneke mezin û malbat di despêkê de û di pey re civak, bên hişyarkirin ku ev tiştî ku tê kirin gunehek mezin e derheqê keçan kêm temen de.

Hewildan erkekî sereke ye ku mirov li ser rawest e, û giring e, ku karekî lezgîn bê kirin ta ku sînorek ji vê diyardeyâ xerab û bivek re bête dîtin, û vê tawana ku hin malbat dikin derheqê zarokên xwe de bibe mijareke sereke ji hikûmeta kantonâ Cizîre re! . Gelo wê dengê me bikin...?!!!.

## Diyardeya Zewaca Keçen Temen Piçûk Li Devera Me.

**D**i civaka kurdi de, li Rojavayê Kurdistanê, û bi taybet di van çend salên dawî de, diyardeyên berbiçav hatine diyarkirin û bandoreke neyînî li ser civaka kurdi kirin.

ev diyardeyên ku em ê tîrêjîn ronaihiyê di vê babetê de bavêjîn ser ku di vê gotarê de qet têrê nake..!, lê merov dikare bêje ku hewildaneke ji bo ku em zanibin ku ev diyardeyên han çîqasî neyînî, "Selbî ne", li ser civaka me. Ji wan diyardeyên ku ez dixwazim behsa wan bikim, zewaca keçen temen piçûk û ên li jî temenê 18 salî, li devera me, sedem û bandora wê li ser derûniya wê keçê û herwiha li ser malbat û civakî bi gişî heye. di van çend salên dawî de pir malbat û bi taybet ên xizan, keçen xwe di temenê pir piçûk de, di dan temen mezinan, û bi bihayekî pir kêm.

Derbarî vê yekê de rîexistinê navdewleti hişyârî dane ji metîrsiya vê diyardeyâ han , û yet ji wan rîexistina Hiyûmin Rayts Woş ku doz li hemû dewleten cîhanê kîr ku vê mijara han berbiçav bigrin.

Rîexistin di daxwaza xwe de dide diyarkirin ku zewaca keçen li jîr

temenê 18 salî, binpêkirineke ji masê wê keçê re, di xwendin û dûrxistina wê ji tund û tujiyê ye. Hin serjîmîrin vê dawîye di din diyarkirin ku hijmara zewicandina keçen li jî temenê 18 salî bi rengekî fermî û li dadgehan li hemû parêzgehîn Sûriyê, gişâsiye", rojê 200 kev", û yên li derveyî dadgehan rojê dîghê (100) keçî..

Lêkolinêrên pispor derbarî vê yekê de, dibêjin ku ev diyardeyâ zewaca keçen temen biçuk di rewşen ne aramîyê û şer de pir zêde dibin û bi taybet ji hîla aborî ve, ku pir malbat mee'bûr dibin ku di vî temenê piçûk de keçen xwe bîzewicinîn. Lê dema ku merov bîhûrbîn li kîtekiten vê diyardeyâ bîmeyzîne rastî gelê çîrokêñ tiraci û derdikevin mixabin!

ji hîla ku piraniya wan keçen temen biçuk û hatine zewicandîn, an hatine berdan pişti demek kin ji zewaca wan, û yan reviyane û yan xwe kuştine û gelek tiştîn din ku dibe cihê xemgîniyê li ba gelek malbatan. Li vir giring e ku em vê pîrse bîkin: Gelo sedem ci ne ku hetanî vê gavê tu hewildan nehatine kirin ji hîla saziyên ku xwe hilbijerîn ji saziyên civaka sîvî! . Gelo wê dengê me bikin...?!!!.

## Ka Em Li Vir Bin

"Gellekan xaniyên xwe firotin; xaniyê ku bi salan kar û xebat û rezili bo kirîna wî dîtin, bi hîsanî firotin, bêyi ku hîsirekê birjînin."

**G**irêdana bi xakê ve, çûna ji welêt, koçberiya bêhempa, nasname, we-latparêzî, xinizi, perîşanî, û riya Ewropayê ya kujer. Ev mijarê heri balkêş in di van rojan de, ku geneşe li ser dibin. Di évarê de dema ku tu di kolanen Qamişloyê de bîgerî, helbet wê dengê telifonan bala te bikşîne, her kesek bi hinck meriv an za-rokên xwe re daxive.

Koçberiya bêhempa pîrsine pîr mezin dertîne, ne tenê girêdayî ye bi nasnameyê, lê bi koçberiya Kurdi, û welatêne gerok ve, dê çi bimîne ji stranen li ser xaka pîroz, an jî nalena la kurden li bajaren Şam û Helebê, ku digotin (Xaka Qamişloka rengîn em nadîn bi malê duniyayê).

Pîrsîrêk rîngin xerab dide, gelo ew ci ye yê bîhêle ku koçberêciwan ji bajarekî mîna Qamişlo / Bajarekî Evînê, şad be bi gîhiştina Ewropayê! Di dimena vîdiyoyêkê de ciwanekî kurd diaxive: "Yadê te digot tu nagîhîjî, lê va ez gîhiştîm", girîjîna wî ciwanî pîr mezin bû, ta astekê ku tu dikarî bibêjî bê ev ji ci dojehê derketiye. Minak pîr in û çîrok pîrtir in, gellekan xaniyên xwe firotin; xaniyê ku bi salan kar û xebat û rezili bo kirîna wî dîtin, bi hîsanî firotin, bêyi ku hîsirekê birjîne.

Dibe ku sedemên çûyîna her kesek ciuda be ji yê dîstîr, lê helbet pîrranîa wan dilxwesiya xwe tînî ziman, tu dîbê qey ev welat tu carî ne warê wan bû, û nameyin rîjî dişinîn şûnwarê xwe, nameyin

dagirtîne bi hestin sexte. Welat di demê zehmetî û wîrân de bi destê mîletê xwe ava dibin, an jî bi kîmanî birîn bi destê wan têne pîçan. Mijareke mîna koçberiyê gellek sedemên wê hene, ci siyasi, ci aborî, lê helbet tiştekî gîring heye ku divabe em li ser rawestin.

Nasname û Girêdana Bi Xakê Ve Dema ku mirov ji welatê xwe koçberi, ya normal ew e ku xemgîniyek hebe; xemgîniyek hebe ji dil û rat be, ji ber ku mirov dev ji koka xwe berdide, û ji ber ku (Şam şekir e, lê welat jê şîfîntir e).

Jineke Kurd şekir li cîranan belav dike, ji ber ku kurê wê nişteciyi wergirt (di kultûrê kurdi de şekir tê belavkirin dema tiştek gellek baş û şîrîn dibe), ev dimen gellek wateyan dike, dibêje ku li te pîroz be welatê te yê nû, û li gorî çîrok û agahî û hevdîtin bi nişteciyên Kurd li Ewropayê, ku ew welat ji ti sûdê ji pirraniya van penaberan nagîrin, û dema ku regeznameyê werdigrin û dibin (Zarokê wî we-latî) nikarin bibin welatiyin baş bo wî welati.

Pîrsîrêk koçberiyê derûnî ye

beriya her tiştî, ji ber mîletê ku li ser stranen xaka welat a zêrîn, xwedî bûye, dê çawa bikaribe bi vê hîsanîyê dev jê berde.

Kesek ji ber astengiyin siyasi

koçber bûn nikaribûn li hember

kîriyaren desthilatdar li ber xwe

bîdin, û nikaribûn bibin rikber-

iyek xurt, ji ber rikberî dema ku

ne rû bi rû be wî ti wateyê nede.




Ebas Mûsa

Kesekî ku bikaribe 9 hezar dollar bide hev û têkeve şepela koçberiyê bîbe û di behran de bimre, yan bîghîje, destek li paş û yet li pêş, wê gellekî bimîne ta xwe yan xwe bîbîne. Mijara koçberiyê mijareke pîr mezin e, û gellek kes sîcdar in ci desthilatdar, an rikberî, yîn ku ta anîha li ser vê qeyrane rawestîyane, lê koçberî bi vî rengê berfereh nema kîryareke kesayetî ye, ku bi kesekî tenê girêdayî ye, mijar anîha girêdayî nasname û hestî girêdana bi xakê ve ye.

(Li vir im, Nobedare dara gwîzê me, Tiwa li hewşê, Nobedare tenûra dayka şîrîn im), ev yet ji wan stranen bû ku Kurden lê guhâr dîkirin dema diçün Ewropayê, û nikaribûn bi dilşadî bibêjîn va em li vir in, iro li ser rîyên mirinê şepelî penaberan xwe dispîrin rîyîn nedîyar da ku bîghîjin we-latîn Rojava, welatê wan, bêyi hîsirekê birjînin, an li paş xwe binerin.

Dê stran bimînin mîna birînekê di gavêna me de, em li vir in, hûn jî li vir in, û di navbera me de tenê çîrok û hestîn sexte, û nîvîsa dirokeke bê xwedî, heye.



Giwanê Ebûdal

xwekuji li welatê me Sûriyê, an li hîrêma me Rojavayê Kurdistanê çêbûye, da piraniya gel û cemawer ji warê xwe koçberî karîn. Lê cûdahî heye di nav van koçkirinan de, ku se dem jiber abûriye. Ku xorten me koçbûn dewletê derdora Sûri, weke Herêma Kurdistanê, Tirkiyê, Libnanê, ci bi hîviya kar û xebatê, ci jiber ne aramiya hîrêmê, tevî pir mal koçkirin, li aramiya xwe ge riyan, ew bi xwe tê û zengin in, mala xwe tev bar kirin..

Wek me got: Ji bo kar çûn, hin jiber nearamî çûn, Lê ev tîstî pir tehlîxwe, ku welat vala bû ji kesen xwe, her wiha rewşa civak û kesatiya war, an hîrêma kurdi vala bû, û abûri rawestîya, çandî rawestîya. Karmendi rawestîya!!.. bi gotinekê Kurdistanê li ber linga çû av û av.

Ji vir weke bangekê em dibêjin, divê destedariya hîrêmê çare-serikê zû bibine, ji xorten me re, ji keçê me re, yê bê hevjin mane, angô bê zewac mane. Ev erd bê çandînî ma ye.. Gelo çawa wê jiyan hevbes be û bin geha jiyanê diqurmiç?

# Helbestvan Yûsuf Berazî (Bêbuhar) Wek Min Wî Nas Kir. (1931-2009)



**"Derdan ci ez diljar kirim ey felek  
Êdî nikarim bijmîrim bûn gelek  
Barê xizanî jî li min hêj ne bes  
Serda ji pîsa re ci ez bûm henek" Bêbuhar.**



Dilawerê Zengî\*

## Gotineke Pêdivî:

**R**ejîmîn şovenist digel tâlankirina dewlemendîya ser xak û bin xakiya welatê me, bi dijwariye mezin êrişî ser ziman, tore, û folklorâ Kurdî dîkin. Lê, herweki xuya ye, ev armanc û daxwaza wan heta niha neçûye seri û di dilê wan de bûye kulek mezin. Ji bo em ji bin destê van rejîmîn şovenist derkevin, bi sedan serhildan û berxwedanêni bi rûmet me daye; bê hejmar law û keçen xwe di vê riye de gori kiriye. Ev ser, di warê parastana ziman, tore, û zartogina Kurdi de jî, bi dijwari dom dike û roj bi roj gûrtir dibe. Ronakbir, nivîskar, helbestvan û hozanê Kurd yên bi rûmet, di nava vî şerî ha de, cihêkî xweyi taybetî digrin. Xebat û têkoşinek giranbiha didin. Pêwist e, ku em vê xebat û têkoşîna hêja û giranbiha kêm nebînin û di vî beşê şerî tevgîra rizgarîxwaziya gelê kurd de, wan tenê nehîlin û ne zindikuj û mîriperest bin, di saxiyê de xwedî li wan derkevin.

## Mijar:

Ji biçûnîya xwe de, min pir ji helbestê hez dikir. Min pir guhdarî li stran, mûzik û awazan jî dikir. Serhawê û helbest, ji min re mîna nan û av bûn. Di jiyana xwe ya rojane de, bê wan qet samana min nebû. Rojên min tev bi xwendîn û nîvisandinê derbas dibûn. Roj bi roj, şêt û şeyda hezkarîn û evîndariya rewşenbîriyê li min gûrtir û hartin dibû. Ji ber agîrê wê evîndariyê, min çavên xwe li úst û akamî digerandin. Min çavê xwe li mirovîn rînas û rîberîn vê evîndariyê digerand. Di seri de, ev ê evîndariya rewşenbîriyê ez bi Seydayê Cegerxwîn û Tirêj dam naskirin. Ez bi Osman Sebîrî, Hesen Hişyar, Ehmedê Palo, Seydayê Keleş, Mele Nûriyê Hesari, Ehmedê Şêna Salih û Rewşen Bedirxan...htd dam naskirin. Ez bûm sulte, şagirt û xwendekarê wan. Li cîvat û rûnişînîwan besdar dibûm. Di baweriye min de, ez guhdareki baş bûm. Belê, rast e, ez baş guhdar bûm. Di cihana wejê, helbest û dirokê de, ne tenê gerok bûm, dilkoçer bûm jî, her roj mîna mirovîkî tî ez li kaniyeke nû digeriyam. Min peyala xwe ji kehniya wan dadigirt û vedixwar. Min hînek jî têna agîrî dilê xwe, bi pend û helbesten wan dişkenand. Min mîna perwanî jî bîna şîrava gulê bax û bustanen wan bin dikir. Li ber awaz û müzika helbesten wan mest û serxwes dibûm. Ez li ser masa wan û li ber dengê çinginîya peyala meynenoş û muxbeçinan hişyari hûnandina helbestê dibûm. Li ber dengê bilbilê dilşadî hevotî perwaze û şîr dibûm.

Di sala 1984-an de, min helbestvanê gewre Bêbuhar, cara pêşî, dit. Ne ku min nav û dengê wî nebihistibû, yan min berhemîn wî bi dengê dengbîjîn mina Mehmed Ezîz, Seîd Gabarî û bilbilê xemgîn Mihemed Şêxo nebihistibû. Lê, heyf e, li hev nedihat ku em hev bibinin. Ew, her di bîr û hizra min de bû ku em ê rojekê hev bibinin.

Lê, çawa?! çilo?! Ú li ku!! Min nîzanibû.. li hev hat û jî bexî min i şipî, di riya Hunermendê mezin Mihemed Şêxo re me li Şamî hev dit. Rojekê destbirakê min hunermendê mezin Mihemed Şêxo bavê Felek hate mala min û mirovek pêre bû. Miroveki bejin û bala wî bilind bû. Bi cilin temiz û şephek bû. Bi qilafet û zend û bend bû. Miroveki pîr müdérin û efendi bû. Miroveki pîr jîxwehe bû. Berçav li ber çavêن wî bû. Di wê rojde, bixwe Seydayê Tirêj jî, li mala min bû. Dema ko derbasî rewangê bûn û çavên wan û Seydayê Tirêj lihev ket, di cih de, silavin germ dane hev. Di wê gavê de, li gorî binavkirin û silavê, min hemâ mîvanê xwe nas kir. Mîvanê min helbestvanê gewre Bêbuhar bû. Ew Bêbuharê ku ez bi hisreta dîtina wî bûm.

Di wê rojde, ji bextê min i şipî, sêbazen celeng li mala min civiyane. Bi rastî min ji dîtina çavên xwe bawer nedikir. Eger min şev û roj xwe bergori Xwedê jî bîka wîli liheb nedihat. Te digot ez di xewn û xeyalan de dijim. Lê, vê carê xewna min rast e. Bi riwekî geş û bi zimanekî xweş berê xwe da min û got: (Birazi! Ez jî mîna Seydayê Tirêj mîvanê te me. Karê ku ez pê hatime mina karê Seydayê Tirêj re, bê te çewa diwana Seydayê Tirêj çêkir, tê ya min jî çêki). Bi rastî ji kêfa re nema erdê ez hilanîm...per û bask bi min ve nine ku ez bîfîrim. Ew kesen ku nav û dengê wan ji min re mîna efsane û xeyalan bûn, iro ez wan li ber çavên xwe dibinim.. Na, na û mîvanê min in jî!! Ez pi bi hatîna wan dilşa bûm. Ji kêfa dilê xwe re min kumê xwe ber bi ezmana ve avêt. Li bajarê Şamî - Li taxa Kurdan li dora bist û pênc rojan (Bêbuhar) mîvanê min ma. Min diwana wî (Zîndan) tev, li ser tilnivîs, ji tîpen Erebî veguhestin tîpen latînî. Li ser daxwaza wî min pêşgotinek ji diwana wî re jî, nîvisand. Helbestvanê berêz jî di vê diwana xwe de, helbestek pir bi nîrx û buha diyari min kir. /Ez spâdarê wî me/. Ji wê rojde, peymana birati, hevalti û dostaniyê me da hev. Di wê demê de, ez û hevalê xwe yê welatparêz û kurdperwer Ehmed Şehab bavê Mihemed, bi hev re, di yek malê de diman. Evî hevalê hêja, li dora sed hejmar ji pirtûka Seydayê Bêbuhar (Zîndan) li ser kîsî xwe çap kir. Bi firotina wan pirtûkan Seyda perê çapkirina hezar hejmari peyda ronikirina riya hişyariyê têne meyandin. Bi awayekî kilasîk helbeten xwe dihûne: (Pesin, şîni, evîn, xweşxwan, perwerî û sirûdi), kêşa helbestan li ser movik û bare ne.

Weharengê bi dirok û mîjûwa gelê xwe ve jî girêdayî bû û leheng, mîrxaş û navdarê dirokê, di helbesten xwe de anîye ziman. Seyda ne tenê li ser heskirina keç û xortan nîvisandiye, lê belê rola keç û xorten xwendevan di rêvreibîna kar û xebatê de mina serî rimê dibîne û bi dengeki bilind hawar û gaziya xwe digihîne

xorten xwendevan û ji wan dixwaze ku bi rola xwe ya dirokî rabin. Seyda, li ser êmişen welatê xwe mezin dibû, û pir ji xeristiya welatê xwe hez dikir. Girêdanek xurt di navbera Seyda û xeristiya welatê wî de hebû. Di helbesten xwe de pir li ser av û dar, gul û giya, deşt û çiya, mîr û kanî, buhar û zivistan, dehl û zevî û bale û tebâyen welatê xwe gotiye.

Çawa Seydayê Bêbuhar di bin baskê helbestvanê me yên kilasik de mezin bû, weharenge gelek helbetvanê me yên kilasiknîvis jî di bin bandora Seyda de mane, û akameke xurt li nîşpe pey xwe re kiriye.

Seydayê Bêbuhar li ser şop û riya helbestvanê helbesta Kilasik ya resen helbesta xwe ristiye. Di helbesta Kurdi de xwedi ciheki berz û diyar e. Xwedi gencineyeke dewlemend û buha ye. Di gasîma helbesta kurdi ya resen de, bazeke serbilind e. Li piştî evi bazê serbilind, bazeke şeyda û bejin bilind heye; ew jî serdarê evindar Seydayê Cegerxwîn e. Bêbuhar mîna gelek helbestvanâ di bin baskê bazê aza nemir Cegerxwîn hînî perwaze û şîre dibe. Bêbuhar di derya helbesta Cegerxwîn de hevotî melevanîyê dibe.

Dara evina wî tim şîn e. Bi hezar berê rengereq xemîlandiye. Lê, heger berê darê tehl nebi şerînî û sipehibûnê jî nadîn. Tenê şerînî gulê bi dîtin û şîravê xweş e. Lê ya xweşir ew e, ku bilbilek şeyda bi deh hawan bixwîne û pesnî xemîl û xêza gelû bide. Wê gavê nuh gulê li naz û kubariya xwe hay dibe, li ber sura bayê sîbê diserçime û bi qurnâzi serî dihejîne. Durvê digirnije, rûgeş û dilşa dibe. Gul! dezgir e, bilbilê şet dilketi ye. Heger tu axaftunke bê sude, lavîjeke bê awaz, sazike bê düzan bi, tucarî tuwê nikarîbî dilê gulê bidestxweki; ji ber ku gulê dilkoçer e.

Çiroka min bi helbestê re dûr û dirêj e. Berî ku ez têkevîm warê stiranê de, min jî helbestî hez kir. Min di riya dan û standinê re jê re kar kir. Min Seydayê nemir Cegerxwîn nas kir û têkiliyê min pê re xurt bûn. Dûr re têkiliyê min bi mamosta Reşidê Kurdi re çebûn. Wi ji hişt ez hînî rîzîmana kurdi bibim. Mele Sirac û Mele Reşid hebûn, geleken din ji hebûn, lê nayêna bîra min. Min di rîya van ciwanîman re gelek pirtûk xwendin; mîna diwana Melayê Cizîri, Mem û Zîna Ehmedê Xanê, pirtûken li ser malbakte xîzan û perîşan bû jî, lê ewê yekê tucarî nikari bû çavkanyîn helbesten wi ziwa û bîmîciqîne, yan berê pînûsa wi ji bîr û bawerîyê wî biguhêrîne. Bi pînûseke bejinbilind û zimanekî rewan û zelal, her çavkanyîn wî diherikîn û dizan.

Di rastî Bêbuhar, heta bi roja dawîn ji jiyana xwe, ji kar û xebata xwe nehatiye xwarê, digel ku ew bixwe ji malbakte xîzan û perîşan bû jî, lê ewê yekê tucarî nikari bû çavkanyîn helbesten wi ziwa û bîmîciqîne, yan berê pînûsa wi ji bîr û bawerîyê wî biguhêrîne. Bi pînûseke bejinbilind û zimanekî rewan û zelal, her çavkanyîn wî diherikîn û dizan.

Di eniya kar û xebatê de, tekoşerekî bêhempa û gewre bû.. gelek caran haatiye girtin û şekcenekirin... lê tucarî radestî nekiriye... û her û her serbilind jîyaye û bi serbilind jî, ji nav me koçkîriye... hezar dilovanî li giyanê wi bibare û cihê wi buhişt be.. Seroke Yekîtiya Nîşkarê Kurd-Sûriya

di seri de karê siyasetê kir, karê siyasetê û dengbîjî li gorî wê demê li hev nedihat. Xelkên cîvakê mirovîn dengbîj qebûl nedikir -bi çaveki kêm lê dimeyzand. Çawa ez ê karê siyasi bikim û dengbîj ji bim?!!! Pir dijwar bû... Bir û bawerîyê min yên ku, bi siyaset û bi doza gel û karê xebatâriyê dihat, zora dengbîjîyê birin. Lê, min ji xwe re her û her distira û awaz çê dikirin...û min awazên xwe dida dengbîjîn wê demê .. Ez çi bikim, bi vî awayî min kela dilê xwe hînik dikir.

Di sibeha roja pêncsemê 15/1/2009-an de, li bajarê Serî Kaniyê -parêzgeha Hisîça, siwarê helbesta resen ji nav me bar kir. Bi çûna wî re stûnek ji stûnen helbesta Kurdi ya resen hilweşî. Sed mihrî û dilovanî li guyanê wî bibare û cihê wî buhişt be. Di dawîya gotara xwe de ez û bîdim mamoste û helbestvanê gewre Bêbuhar ku kurtejînenîgariya xwe bi we bide naskirin:

## Kurte Jînenîgariya min:

Ez, Yûsif kurê 'Eli' Eliyê Şêxo me, pêşî ciwarê bav û kalên me bajarê Kobanê bû. Lê piştî ferманa osmanîyan bav û kalên me cûn bakurê bajarê Helebê, li gundê Tilecîrê bi ciwar bûn. Ez di sala 1931-ê de, li wî gundi ji dayik bûm. Di sala 1947-an de, me jê bar kir û em, li Minbicê bi ciwar bûn. Piştî heft salan, ango di sala 1954-ê de, em hatin parêzgeha Hisîça-bajarê Serî Kaniyê û ta nuha jî em lê dijin. Berî ku ez bibim helbestan dengê min gelekî xweş bû, min li tenburê "bîzîq" dixist û min bi heval û dosten xwe re di civatên gelêrî de stiran di-gotin.. Stiranên me wek ku min gotî hew di şevbuhêr û civatên gelêrî de bûn. Di wê çaxê de tomarkirin tune bû.

Çiroka min bi helbestê re dûr û dirêj e. Berî ku ez têkevîm warê stiranê de, min jî helbestî hez kir. Min di riya dan û standinê re jê re kar kir. Min Seydayê nemir Cegerxwîn nas kir û têkiliyê min pê re xurt bûn. Dûr re têkiliyê min bi mamosta Reşidê Kurdi re çebûn. Wi ji hişt ez hînî rîzîmana kurdi bibim. Mele Sirac û Mele Reşid hebûn, geleken din ji hebûn, lê nayêna bîra min. Min di rîya van ciwanîman re gelek pirtûk xwendin; mîna diwana Melayê Cizîri, Mem û Zîna Ehmedê Xanê, pirtûken li ser malbakte xîzan û perîşan bû jî, lê ewê yekê tucarî nikari bû çavkanyîn helbesten wi ziwa û bîmîciqîne, yan berê pînûsa wi ji bîr û bawerîyê wî biguhêrîne. Bi pînûseke bejinbilind û zimanekî rewan û zelal, her çavkanyîn wî diherikîn û dizan.

Di eniya kar û xebatê de, tekoşerekî bêhempa û gewre bû.. gelek caran haatiye girtin û şekcenekirin... lê tucarî radestî nekiriye... û her û her serbilind jîyaye û bi serbilind jî, ji nav me koçkîriye... hezar dilovanî li giyanê wi bibare û cihê wi buhişt be.. Seroke Yekîtiya Nîşkarê Kurd-Sûriya

Bêbuhar. Şînbû rîhan - gotin û awaz Bêbuhar.

Eman dilo - gotin û awaz Bêbuhar.

Gulîzî - gotin û awaz Bêbuhar.

Dilê min her bi ahîn e - gotin Bêbuhar - awaz mamosta Mihemed Eli şakir.

Sérîn tu cinara min î - gotin Bêbuhar awaz M.M. Eli Şakir.

Mehmûd Ezîz çû êzgeha kurdi li Bexdayê û stiran li wir tomar kirin.

Piştire Se'îd Gabarî derket. Hat cem min, min helbest danê.

Ew jî ev in:

Koçê mi bar kir. Hat xweş buhar. Bê bestx felek. Di tarî da.

Ew jî çû êzgeha kurdi li Bexdayê û stiran tomar kirin.

Min hunermend Mihemed Şêxo nas kir, min gelek stiran dan wî jî. Mîna:

Hebs û zindan. Ez bûm ferar. Sérîn tu cinara min î. Rabe ji xewê. Yarê şekir. Pismamo. Şeva tarî. Dayê (ez jî bi cî bim). Dayka dilovan. Eman. Eman. Çibkim bi can. Derdan ci ez dil jar ki. Koçê mi bar kir. Welat welet. Gulîzî. Eman dilo. Perwîn (gotin: Rêncber-awaz:Bêbuhar). Küba û Vêtnam.

Ü hindek stranbêjîn dî jî hene min helbest tev awazan daye wan wek Zubêr Salih, û Mistefa Xalid .....

## Berhemîn çapkirî :

1.Zîndan helbest /1988. Pêşgotina: Dilawerê ZENGÎ.

2. Bang hebest /1997

3. Raperîn helbest /2002

4.Serxwebûn helbest/2006. Pêşgotina: İbrahim EL-Yûsuf.

5.Pêşketin helbest/2007

Ü gelek diwânên min yên ne çapkirî hene".

Di dawîya gotara xwe de, ez dikarim bîbêjîm gorbuhişti Yûsîf Berazi (Bêbuhar)ek ji siwarê helbesta resen ya kurdi bû. Diyar e, para mezin ji helbesten wî mina dara kenêrê bîhîn xweş in.

Bi rastî Bêbuhar, heta bi roja dawîn ji jiyana xwe, ji kar û xebata xwe nehatiye xwarê, digel ku ew bixwe ji malbakte xîzan û perîşan bû jî, lê ewê yekê tucarî nikari bû çavk



Keça Kurd a bi navê Fatima Ghadan, li Norwêcê bû namzeta Şaciwana vî welatî.

Keça Kurd Fatima Ghadan ku xelkê bajarê Mihabâdê ye û hemwelatiyê Norwêcê ye, ji bo pêşbirka şaciwaniya vî welatî bû berendam.

Li gel Fatima Ghadan bi giştî 12 jinen ciwan besdarê vê pêşbirkê dibin.

Derbarê besdarbûna vê pêşbirkê

## Peyva wendayî

1	2	3	4	5	6	7	8
1 N	E	W	A	L	A	M	B
2 A	X	A	L	I	T	A	I
3 È	F	R	E	B	È	L	B
4 L	I	B	I	N	F	A	E
5 Y	E	E	Y	E	È	M	N
6 L	A	M	B	Û	K	R	E
7 A	K	Ş	Î	R	I	M	B
8 N	A	V	È	K	Û	Ç	E

Bibe çükê newala, nebe mirîsha nav mala. Axa li kêfê ye, mal li bin berfê ye.

Peyva wendayî: Ji 6 tîpan: Amûereke mûzîkê.

## Hejmara bûrî

### Tembûr

### ASOYÎ

- Cengeke Kurdistan kire du parçê.
- Çirok û gotinê berê.
- Wekhev, şalyar.
- Ne bi tevayı (vajî), navekî kuran.
- Nivîsa mûzîkê.
- Kurê kur, zeman.
- Bêdengî û bêlivî, ji bo bersivdana bangê.
- Tersî kevin.

### STÜNÎ

- Post, ji pesnên keçan.
- Kesê afirandinê dike.
- Lîs (bê dengdêr), ji berhemên rojnamegeriyê.
- Binê kiras, koma lîstikvanan.
- Bajarekî li Tirkîyê, rojeke heftiyê.
- Bavê pêxember İbrahim (vajî).
- Cureyeke desmalên jinan (vajî).
- Navekî keçan (vajî), dara tirî.

Kurdî	
Xweş e	معاشه
Hevkêşî	اشتراك
Pişkdarî	استئجار
Renexuri	تواطؤ
Pêlangêrî	نفق
tonêl	ازلام
destek	مطاف
Bêsinor	احتاج
Nerazibûn	اعتصام
Xweasêkirin	المقوض الأعلى
Karsiparteyê bala	



Federasyona Fitbolê ya Tirkîyê qebûl kir ku navê Diyarbakırspor bibe Kulûba Karê Sportif ê Amedê.

Federasyona Fitbolê ya Tirkîyê daxwaza berpirsên Diyarbakırsporê qebûl kir û bi vî awayî navê wê hate guhertin û bû Kulûba Karê Sportif ê Amedê anku Amedspor.

Serokê Kulûba Diyarbakırsporê Nurullah Erdem bi daxuyaniyê liiga 2 ya Tirkîyê de cîh digre.



## Zübêjj

Rovî li rê gerya rê li  
rovî gerya

## Mamik???

Tilîyek danîn li erdê.. pir in ji vir heyâ  
Serhedê..

Dipeyive bi navê Xwedê.. ew çi ye ?

bersiva 25an : kevçiyê xwarinê

## Xaçerêz

1	2	3	4	5	6	7	8
1							
2						█	
3		█					
4			█				
5	█			█			
6				█			
7					█		
8		█					

## Hejmara bûrî

1	2	3	4	5	6	7	8
1 N	A			K	U	R	I K
2	W	E	K		O	D	E
3 R	A	Z		A	J		S
4 Î	K			Î	N	A	K
5 S		E	V		N	E	H
6 I	R	M		T	E	V	N
7 P	A	R	T	Î		O	K
8 Î	S			Î	R	E	K